Nûçeyên Hackney Homes: Çileyê Pêşîn 2008

Xelatên şaredar ji karsazîyan re vekirî ne

Xelatên Karsazîyan ên 2009an ên Şaredarê Hackney dest pê kirine û karsazî û karsazên herêmê ji bo tevlêbûnê tên vexwendin. Xelatên salane, ku nuha di sala çaran de ne, ji bo naskirin û pîrozkirina mikemelî û cîhêrengîya karsazîyên li navçeyê ne.

Jules Pipe, Şaredarê Hackney, wisa digot: “Karsazî û teşebusîyên piçûk li dilê aborîya herêma Hackney ne û piştevanî û teşwîkkirina van sazîyan ê ji bo afirandina bêtir derfetan û teşwîkkirina muteşebîsan alîkarîyê bike.

“Ev xelat bi armanca teşwîkkirina mikemelîya pratîka karsazîyê li seranserê navçeyê, raberkirina serketinên di civaka karsazîya Hackney de û xelatkirina şirîke û kesayetîyên ku ramanên karsazîyê gîhandine asteke bilindtir hatine sazkirin.”

Di nav neh kategorîyên xelatan de ev hene: Muteşebisê Ciwan ê Herî Baş ê 2009an, Ramana Karsazîyê ya Nuh a Herî Baş a 2009an. Divê karsazî û kesayetî berî 23.02.2009 seet 17.00an serîlêdanên xwe pêşkêş bikin û hemû fînalîst ê ji bo çalakîyeke muhteşem a bi cilûbergên fermî bên vexwendin.

Ji bo bêtir agahîyê biçin vê sîteyê
www.hackney.gov.uk/mayorsbusinessawards

Demên vekirî yên dema Krîsmis (Noel)

Demên Vekirî yên Hackney Homes ji xêndî rojên jêrîn ên dema têrmijûlîya Krîsmis (Noel), wek her tim in.

Roja Krîsmis (26 Çileyê Pêşîn), Roja Boksîng (Piştî Noelê) (27 Çileyê Pêşîn) û Roja Sersalê (1 Çileyê Paşîn): hemû ofîsên taxê û ofîsa navendî wê girtî bin.

Ji bilî rojên li jor gotî, Ofîsên Taxê yê wek her tim (9.00-17.00) ji bo xebatê vekirî bin. Ji kerema xwe bi bîr bînin ku ji ber dema betlanê dê hinek xizmet kêmkirî bin.

Navenda Têkilîyê ya Tamîran ê rojên Krîsmis, Piştî Krîsmis û Sersalê 24 seetan vekirî bin - lê belê, tenê ji bo xizmetên tamîra acil. Heke rewşeke we ya acil hebe, ji kerema xwe telefon bikin bo 020 8356 3691.

Krîsmis û Sersala we Pîroz be

2008 ji bo Hackney Homes bûye saleke din a têrmijûl û berhemdar, û em dixwazin hun demeke Krîsmis a pir cejn derbas bikin.

Dema ku li Mare Street lampên cejnê vêdikevin û hewa bêtir sar dibe, êdî dem e ku em şûnve li sala çûyî binêrin û berê xwe bidin 2009an.

Îsal ji bo me giştan meydanxwaz bû, me teftîşa komîsyona kontrolê dît û em ê di beşa yekem a 2009an de bibihîsin ku em bi ser ketine yan na. Wek ku haya we giştan ê jê hebe, em encameke 2 stêrk hêvî dikin ku ew ê £225 milyon fona Hikûmetê bide berdan, da ku em li bernameya Malên Minasib a pir bi pêwîstî razandinê bikin.

Ji me re bû saleke serketinan jî; lêkolîna me ya kirêdaran dîyar kir ku di 2006an de jêxweşbûn %9 zêde bûye û her weha nisbeta bersîvdayinê jî bi %39an rekor pêk anîye. Ev yek dîyar dike ku em bi serketinî bi kirêdarên xwe re têkildar bûne û ku hun difikirin ku hêja ye ku meriv şûnve agahîyê bide. Lewra, sipas ji bo we hemûyên ku tev li lêkolînê bûne. Dengê we li pêş çav tê girtin û em ê di Sala Nuh de li gel planên xwe yên çêtirkirinê li we vegerin.

Haya me jê heye ku di van demên meydanxwaz de, gelek ji we dê li ser fînansê bi fikar bin, bi taybetî di dema Krîsmis de. Lewra me di vê hejmarê de li ser vê mijarê bêtir agahî daye, ku heke alîkarî pêwîst be li kuderê tê bidestxistin.

Nuha havîn pir dûr xuya dike, lê belê em giştbi tevlêbûna rojên kêfê yên li sîteyên we kêfxweş bûn. Îsal deh Komelên Kirêdar û Nişteçîhan (KNN) hewl dane ku van çalakîyan birêk bixin û yên berê ewqas serketî bûn ku em plan dikin ku vê modelê sala bê jî pêk bînin.

2008 her weha salek wisa bû ku Dema Pirsê hat ser Hackney Homes, li dor 200 kes ji we tev li vê çalakîya di Cotmehê de bûn ku li ser biryarên ku em didin pirsan ji me bikin.

Û bi banga Xelatên Nişteçîhan ên 2008an sal hat qedandin. Îsal me hejmara tevlêbûyîyan duqat kiribû û çalakî awayekî hêja yê naskirina karê dijwar ê nişteçîhan bû, ku pirê caran li sîteyên me dikin û hay jê çênabe.

Em betlaneyeke cejnê ya ewle û 2009eke şa ji bo we û malbata we dixwazin!

Di Krîsmis de demeke hêja derbas bikin!!

Tarîfa Tartên bi Qîme

Tiştên ku tev li Tartên bi Qîme dibin:

- Hevîrê şikeva ji bo 2 tartan.
- 2 fîncan sêvên hûrkirî
- ½ fîncan mewîj
- 16 x nîv gwîzên pekan ên hûrkirî
- 3 kevçîyên xwarinê yên çêja rom (rum)
- Qîmeyê fêkî

Talîmat ji bo Tarta Bi Qîme:

- Hevîrê şikeva amade bikin li binê firaxa tartê ya 8 inç raxin.
- Di taseke mezin de, qîmeyê fêkî, mewîj, sêv û pekanan li hev bixin.
- Çêjê hêdî hêdî tev lê bikin û li hev bixin, heta ku baş tev lê bibe.
- Bi kevçî têxin nav şikeva.
- Jorê hevîrê şikeva gindêr bikin û li ser têxistîyan bicîh bikin.
- Qeraxa şikeva lê bipêçin.
- 30 deqîqan bipêjin an jî heta ku zêr-qehweyî bibe, di germahîya 350 F de.

Bi kêfxweşî bixwin!

Naskirina yê herî pak ê Hackney

Gordon Bellê ku 56 salên çûyî ji bo çêtirkirina Hackney xebat kiriye bê guman bandoreke berbiçav li navçeyê kiriye. Malnişîna (teqawît) wî nêzîk bûye, lewra *Nûçeyên Hackney Homes* xwe gîhand wî zilamî ku bi tevlêbûn, gîyan û coşa xwe ya civakî ewqas navdar e.

Karê pêşengî yê Gordon ê sektorên xanî, tendurustî û perwerdê di 2001an de bi awayekî fermî hat naskirin, wê gavê Xelata şaredarîya Hackney ya 'Honorary Freeman' (xelateke sipasîya xizmeta berbiçav) sitend.

"Sitendina Xelata Navçeyê ji bo min yek ji kêlîyên herî serbilind bû. Bê guman, min hêvî nedikir ku ji bo kirina tiştekî ku min ewqas jê hez dikir, bi awayekî wisa fermî bêm naskirin – û ev jî karê ji bo çêtirkirina jîyana li Hackney ji bo gelê Hackney e."

Gordon di gelek desteyên rêvebir ên nexweşxaneyan de û di Desthilatîya Tendurustîyê ya wê demê ya Hackney de xizmket kiribû, lê belê tevlêbûna wî ya alîkarîya pêşengîya perwerdeya pêwîstîyên taybetî ji bo zarokan di derengê 1960an de wî herî pir serbilind dike.

Gordon wisa digot, “Hemû zarok dikanin bên perwerdekirin. Ji ber vê yekê ye ku min gelek dema xwe wek Serok an Alîkarê Serokê hemû xwendegehên pêwîstîyên taybetî yên Hackney derbas kir. Piştî 10 salên xebata dijwar, me xwendegeha yekemîn a pêwîstîyên taybetî ya Stormont House saz kir, ew dûre li seranserî Londonê peyde bû.”.

Tevlêbûna Gordon a wek Cîhgirê Serokê Weqifên Dêrên Herêmê yên Hackney, weqifeke ku ji bo gelek sazîyên herêmî alîkarîya diravîn pêşkêş dike, hatiye wê wateyê ku ew di alîkarîya pişteva nîya projeyên cîhêreng ên perwerde û tendurustîyê de roleke sereke bilîze û bi taybetî bi giranî tev li tevgera wargehên muhtacan bûye.

Gordon di mijarên xanî de her tim bûye endamekî proaktîv ê civaka Stamford Hill. Ew berê Serokê Panela Xanî ya herêma xwe û Serokê Desteya Rêvebir a Regenerasyona Stamford Hill û Woodberry Down bû.

Gordon wisa digot, “Nifûsa Hackney yek ji yên herî cîhêreng ên vî welatî ye, lê belê bi dîtina min Hackney ji xwe li vir derdikeve pêş … hêmana mirovan e ku Hackney dike cîhê îro.”.

Em bi tevayî bi wî re ne, rojbûna wî ya 75an nêzîk dibe, lewra Hackney Homes dixwaze ji Gordon re ji bo hemû xebata wî ya dijwar û tevlêbûna wî sipas bike û di malnişîna (teqawît) wî de jê re xweşîyê hêvî dike.

Dibe ku Karmendên Vezîvirandinê (Recycling) werin li derîyê we bixin

Tîmeke 15 pêşdebirên vezîvirandinê (recycling) ê ji Meha 1ê ya 2009an û pey ve li seranserî Hackney li derîyan bixin. Karmend ê biçin hinek sîteyên hilbijartî yên Hackney Homes û evan bikin:

- xizmeta nuh a vezîvirandinê bi nişteciîhan bidin naskirin
- li ser ku tesîsên herî nêzîk ên vezîvirandinê li kuderê ne agahîyê pêşkêş bikin û mirovan teşwîk bikin ku tev lê bibin
- projeya avêtîyên xwarinê ya ku li hinek sîteyan tê birêvebirin bidin naskirin û
- pirs û şûnve agahîyên li ser xizmeta nuh a vezîvirandinê bistînin

Heke li ser vezîvirandina li Hackney pirsên we hebin, telefon bikin bo xeta alîkarîya yekser a Vezîvirandinê li 020 8356 6688.

Dema pêşberîyê

Nûçeyên Hackney Homes dixwaze bizanibe ku bi dîtina we di jîyana li Hackney de tiştê herî baş çi ye.

Hema pêşniyarên xwe email bikin bo HousingEditor@hackneyhomes.org.uk an jî telefon bikin 020 8356 3527. Hun ê tev li pişkeke xelatê bibin ku bileteke

malbatê (x4 bilêt) ya dahnê biroj ê Mother Goose (Qaza Dayik) li Hackney Empire li Mare Street bistînin.

Agahîya sertayî ji bo ewlebûna we û mala we di vê Krîsmasê (Noelê) de

Nuha sezona cejnî germ dibe, lewra Hackney Homes û Polîsê Navçeya Hackney tînin bîra nişteçîhan ku çend kirinên hêsan ê we û malên we ji çavên nêrevan ên dizên malan biparêzin.

Derîyên kêlêkê yên vekirî, paceyên têketinê yên vekirî û dirêncekên li derve hiştî, gişt ketina xanîyekî hêsantir dikin û dizekî muhtemel teşwîk dikin ku careke din jî lê binêre.

Hinek agahîyên sertayî ku hewesa dizekî bişikînin ev in:

- Tucarî mifteyeke zêde li cîhekî nêzîkî derîyê pêşîyê veneşêrin - diz hemû cîhên veşartinê dizanin.
- Tucarî mifteyên xanîyê xwe bi etîket nekin, dibe ku wenda bibin û têkevin destên xeraban.
- Tiştên bi nirx dûrî paceyan hilînin.

Agahîyeke baş, heke hun di dema betlaneya vê Krîsmisê de ne li malê bin, bila mala we wek ku kesek lê dimîne xuya bike. Hun dikanin bi van awayan bikin:

- Demjimêran saz bikin ku lampe û radyoyan otomatîk vêxin û vemirînin;
- Ji heval an cîranekî bixwazin ku biçin û qutîka nameyan an ber derî vala bikin; û
- Perdan bikişînin, hinek ronayî bihêlin û bila radyo vekirî be.

Hinek xalên din ku hêja ne mirov li ser bifikire:

- Li malê zêde pereyê neqît nehêlin. Hemû pereyê ku pêwîstîya we pê tuneye têxin bankê.
- Hay ji xwe hebin ku kesekî nedabe dû we, bi taybetî piştî kişandina alîkarîya sosyalê/pereyê malnişînê.

Di rewşeke acil de û/an ji bo raporkirina çalakîyeke sûc, telefon bikin bo polîs li 999. Ji bo hemû rewşên ne acil, telefon bikin bo polîs li 0300 123 1212.

Vê zivistanê nebin mexdûrê agir

Her sal li dor pêncî Londonî di agirên xanîyan de jîyanên xwe ji dest didin, û piranîya van mirinan li malê diqewimin. Zivistanî rîsk zêde dibe, ji ber ku mirov bêtir dema xwe li malê derbas dikin û bêtir germker, find û pêwengên pijandinê bikar tînin.

Nûçeya baş ew e ku piranîya agirên malan dikanin bi çend tedbîrên hêsan pêşî lê bê girtin.

Di mehên zivistanî de, temîyên jêrîn bi bîr bînin:

- Li her asteke mala xwe alarmeke dûmanê saz bikin û alarman bi rêzdarî seh bikin ku dixebitin an na
- Kinc û tiştên din dûrî germker an agiran bihêlin
- Bila hemû pêwengên elektrîkî di rewşeke ewle ya xebatê de bin, kabloyên kevn û peritî û fîşên şikestî biguherînin û ji tozê dûr bihêlin
- Findan (mûm) bi baldarî bikar bînin û tucarî bi tenê nehêlin
- Berî ku hun têkevin nav nivînan, her tim betanîyên elektrîkî vemirînin û betanîya xwe bi rêzdarî bidin servîskirin
- Cixareyan bi baldarî vemirînin – tucarî di nav nivînan de cixarê nekişînin (yek ji sedemên sereke yên agiran jî ew e ku meriv bi cixara vêketî re bi xew de dihere).
- bila ronahîyên Krîsmis li gora Standarda Brîtanî (Marka firfirokê) bin

Kart, gore an kaxetên pêçanê ku li nik agir an germkeran bên hiştin, tê wê wateyê ku meriv li belayê digere, her weha ronahîyên perîyan ên ku kabloyên wan zirar dîtine yan findên wan bê xwedî ne.

Heke li ser xetera potansîyel a êgir li mala we fikarên we hebin, çima Serdanên Ewlekarîya Agirê Malê yên BÊPERE ji alîyê Tîma Agirkujî ya Londonê naxwazin? Agirkujên ji îstasyona agir a herêmê serdanan dikin û di nav karên wan de li cîhê pêwîst, bêpere bicîhkirina alarma dûmanê û şêwirdarîya li ser ewlehîya elektrîkî, germker, planên revê û rûtînên ewlehîyê heye.

Telefon bikin bo 08000 28 44 28 ku Serdaneke Ewlehîya Agirê Malê ya Bêpere saz bikin, an jî ji Ofîsa Taxa xwe Karteke Sewkê bistînin.

Bila nişteçîh werin û li Wyke Estate kêfa Halloween bikin

Komela Kirêdar û Nişteçîhên (KKN) Wyke Estate li kluba civakî ya sîteyê partîyeke Halloween saz kir ku bi qasî 100 nişteçîhan xwe xemilandin û tev lê bûn.

Carla Greenhow ku vê nêzîkê wek seroka KKN hatiye hilbijartin, digot ku bi hejmara tevlêbûyîyan coş bûye, ku çalakî hatibû plankirin ku ciwan û kal û pîrên nişteçîhên sîteyê bihîne ba hev.

Wek ku hun dikanin bibînin, hemûyan kêf kirin!

Heke hun dixwazin tev li KKNa herêma xwe bibin an KKNekê saz bikin, telefon bikin bo tîma Tevlêbûna Nişteçîh li 020 8356 7845.

Bi çenek alîkarîya hevalan îdare kirin …

Komeke nişteciîhên Millfields Estate bernameyeke şêwirdarîya hogiran daye destpêkirin ku Komela Kirêdar û Nişteciîhên (KKN) sîteyê koordîne dike.

Bi saya granteke fonê ya bi rêya Team Hackney,KKN ji bo nişteciîhan kurseke 10-heftan da destpêkirin û heta nuha ji bo hemû temenan serketî bûye. Piştî qedandina bernameyê, tevlêbûyî dibin şêwirdarên perwerdebûyî yên bi sertîfîka.

Seroka KKN, Carol Jokhoo wisa digot: “Ev kurs gişt ji bo dirêjkirina destê alîkarîyê ji bo pişteva nî û teşwîka kesên din û her weha ji bo wan kesên ku pêwîstî bi kesekî hene ku jê re vebin, bipeyivin û lê bê guhdarîkirin e.”

Mamosteyekî serbixwe û kûalîfîye kursê birêve dibe û mijarên wek xwe-avakirin, têkilî ava kirin, tevlêkirin û tevlêbûn, hêzdarbûn û tendurustîya hisî di nav de ne.

Chereen Allenê ji Millfields Estate bi temîya dêya xwe ku wê jî kurseke şêwirdarîyê ya wek wê qedandibû, xwe li bernameyê qeyd kir.

“Ez bi hewes im ku bi ciwanan re xebatê bikim, bi taybetî mirovên di rewşa xesas de, lewra jîrektî û zanîna ku ez bi rêya vê kursê bidest dixim divê ji min re bibe alîkar ku vê yekê pêk bînim.”

Ji bo agahîya li ser derfetên tevlêbûnê li sîteya we, têkilî çêbikin li gel Tîma Tevlêbûna Nişteciîh a Hackney Homes li 020 8356 7845.

Nişteciîhên SBK nêrînên xwe dibêjin

Îsal berî nuha, Hackney Homes li ser navê Sazîyên Birêvebirîya Kirêdar (SBK) ên ku nuha li Hackney xebatê dikin, lêkolînek şand. Dema ku kirêdar biryarê distînin ku birêvebirîya xizmetên xanî yên li sîteya xwe, wek mînak pêkanîna tamîran, komkirina kirê û paqijîya sîteyê, bi xwe bikin, SBK çêdibe.

Ev lêkolîna yekem a SBK bû ku hat belavkirin û sipas ji bo wan nişteciîhên ku ji bo bersîvandinê dem veqetandin.

We ji me re çi got:

- Bêtirî %70ê nişteciîhên SBK ji xizmetên ku SBK pêşkêş dike xweş in
- Piranîya bersîvdaran, paqijîya sîteyê û lênêrîna zemîn li gel tamîrên hevpar û yên rojane, bi dilê wan bûne yan pir bi dilê wan bûne.
- Awayê ku bi mijarên şêlên antîsosyal mijûl dibin, tenê bi dilê kêmî nîvê bersîvdaran bû

Hackney Homes ê di destpêka 2009an de bi SBKan re xebatê bike ku li van encaman û qadên fikaran ku nişteciîhan bal kişandine ser binêre.

Heke hun bi hewes bin ku tev li SBKa xwe bibin ku gotina xwe bikin, têkilî çêbikin li gel Alex Heslop li 020 8356 6027 an jî email bişînin bo alex.heslop@hackneyhomes.org.uk ku bêtir agahî bidest bixin.

Xêzandina Bajêr - Pêşangeha huner karên hunerî yên herêma Hackney raber dike

Di hejmara Cotmehê ya Nûçeyên Hackney Homes de, me pêşbirka hunera Xêzandina Bajêr ji bo nişstecîhên Hackney daxuyanî kir ku ji me re wêne û fotografên ku jîyana li Hackney raber dikin bên şandin.

Tevlêbûn cîhêreng bûye û perspektîvên guhertî yên Hackney raber dikin. Ji yên li vî rûpelî raberkirî xuya dibe ku, yelpazeyeke balkêş ya teknîk û stîlên afirandêr a nişstecîhên Hackney heye. karên hunerî yên kurtelîstkirî û serketî yê dûre di vê mehê de di 17ê Çileyê Pêşîn de li Xelatên Nişstecîhan bên raberkirin.

Sam Lewis, Karmenda Tevlêbûna Nişstecîh ya Hackney Homes wisa digot, “Tevlêbûn xuya dikin ku mirovan çiqas dem û hewldan xistine nav karê xwe. Di her yek ji van berheman de, hun dikanin çêtir têbigihêjin ku Hackney ji bo hunermend tê wateya çi û ku çawa berhema huner portreya nêzîkbûneke guhertî ya huner raber dike”.

Di 18.12.2008an de roja Pêncşemê seet di navbera 16.00 û 19.30an de li Assembly Hall, Hackney Town Hall, pêşangeheke taybetî heye ku hun dikanin li wê derê berheman û hunermendan bibînin. Ji bo ku tev li çalakîyê bibin, ji kerema xwe têkilî çêbikin li gel Tîma Tevlêbûna Nişstecîh li 020 8356 7845 an jî email bişînin getinvolved@hackneyhomes.org.uk

Meşên li Sîteyan

We dizanî ku Hackney Homes meşên li sîteyan saz dike? Larmendên ji Ofîsa Taxê û tîmên Paqijîya Sîteyê û Lênêrîna Zemîn li gel nişstecîhên herêmê sîteyan teftîş dikin û hemû mijarên li ser kirêdar û xwedî-lease'an gotûbêj dikin.

Heke hun dixwazin tev li meşa bê ya li nêzîkî we bibin, bi rêya Ofîsa Taxa xwe li gel Birêvebirê Sîteya xwe têkilî çêbikin.

Meşên bê - Çileyê Paşîn 2009

Amwell Court	6
Wayman Court	6
Wilton Estate	7
Boscobel House	7
Portland Rise Estate	8
Tower Gardens Estate	9
Milton Gardens	12

Geffrye & Stanway Estate	12
Beecholme Estate	13
Newnton Close	13
Durley House	14
Faircroft	14
Goodrich House	14
Moundfield Road	14
Stannard Road	14
Stanton Court	14
Summit Estate	15
Woodberry Grove	15
(7 blok di nav de)	
Kings Crescent	19
Colville	22
Fellows Court	22
Parkside Estate	22
Banbury Estate	29

Civînên Bê yên KKN

Heke hun tucarî neçûbin civîneke Komela Kirêdar û Nişteciîhan (KKN), nuha demeke baş e ku biceribînin.

Ji bo tarîxên Çileyê Pêşîn 2009an li jêr binêrin

Warburton and Darcy	2
St Mary's Estate	6
Fawcett	14
Banister House	14
Boscobel	15
Webb	21
East Reservoir	22

Tarîx dikanin biiguherin. Ji bo sehkirina dem û cîhan, ji kerema xwe telefon bikin bo Tîma Tevlêbûna Nişteciîh li **020 8356 7845.**

Tundûtûjîya nav malê û sûcê nefretê çawa rapor bikin

Di lêkolîna vê nêzîkê ya jêxweşbûna mişterî de, we ji me re got ku pêmijûlbûna şêlên antîsosyal (ŞAS) ji bo we yek ji tiştên herî girîng e.

Hackney Homes bi rêya Project Excellence teknolojîyeke nuh saz dike - projeyeke ji bo herikandina xizmetên mişterî dîzaynkirî. Yek ji kêrhatîyên ku ew ê pêk bîne xizmeteke bêkêmasî û bileztir e, ji bo dema ku nişteciîh ŞAS rapor dikin.

Proje nuha li seranserî Ofîsên Taxê bicîh bûye. Tê wê wateyê ku hemû doz dikanin bên qeydkirin û bi awayekî hevgirtî bê çavdêrîkirin û nişteciîh dikanin bi hêsanî hejmareke referansê bibêjin û li ser doza xwe ya taybetî bistînin.

Şêleke antîsosyal çi ye?
Şêlên antîsosyal hemû şêlên ku li herêmekê zirarê dide kalîteya jîyana nişтecîhan, dibe sedema acizî an alarmê ne. Dengezar, mijûlîya narkotîkê, dizî, vandalîzm û fahîşetî di nav de ne. Her weha çewisandin û sûcê nefretê jî di nav de ne.

Tundûtûjîya nav malê çi ye?
Tundûtûjîya nav malê tundûtûjîya fîzîkî, hisî, psîkolojîk an cinsî ye ku bi serê mirovên di têkilîyeke nêzîk de tê. Ev dikane di navbera tepik, pehîn, derb, hejandin, destavêtin û ji bo kuştinê birîndar kirinê de biguhere. Her weha çewisandin jî di nav de ye, wek mînak, name yan bangên telefonê yên domdar, gefxwarina tundûtûjîyê û xerabkarîya hisî, psîkolojîk an heş jî di nav de ne. Dîsa şêlên ku malbat belê dikin an ewên ku jê re çandî tê gotin, wek zewacên bi darê zorê, kuştinên namûsê an pevguherîna jinan.

Sûcê Nefretê çi ye?
Sûcên nefretê hemû sûcên krîmînal in ku li dijî kesekî an milkekî ji ber nefreta sûcdar a li hemberî kesekî, bi sedemeke jêrîn pêk tê:

- nijad, reng, eslê etnîkî, hemwelatî yan eslê netewî
- ol (dîn)
- zayend (cins) an nasnameya zayendî
- meyla cinsî
- kêmendamî (seqetî)

Sûcê nefretê dikane bi gelek awayan biqewime, êrîşên fîzîkî, gefxwarina (tehdît) êrîşê û xerabkarîya devkî yan heqaret di nav de ne.

Heke ji ber yek ji yên jorîn pirsgirêkên we çêdibin, ji kerema xwe li gel Ofîsa Taxa xwe têkilî çêbikin *(ji bo kitkitan li rûpelê paşî binêrin).*

Şêwirdarîya kontrola kêzikan

Hackney Homes Xizmeteke Kontrola Kêzikan a Hîjyenî heye ku ji bo mijûlbûna kêzikên nexwestî li mala we alîkarîya we bike.

Hebûna kêzikan, cirdon, mişk, gêrikên fîrewn, kêzik, bizmik (gawik), zirqîtik, mozqirtk û mozên sor dikane êrîşker be, xeterên înfeksîyonê pêk bîne, xwarinê jahrî bike, zirarê bide tiştan û acizîyê çêbike.

Hun dikanin çi bikin:

- Heta ku hun dikanin zû, pirsgirêkê ji me re rapor bikin. Kirêdar û xwedî-lease'ên Hackney Homes divê li gel Navenda Têkilîyê ya Xanî li 020 8356 3691 têkilî çêbikin.
- Temî yan talîmatên ku karmendê Kontrola Xeşaratan dane we bişopînin

Ji bo bisînorkirina rîska mêşûmor û serdegirtina wan:

- Xwarinê binixumînin an têxin firaxên ku xeşarat nikanin têkevinê

- Divê yên rijîyayî tavilê bên rakirin
- Avêtîyan têxin bermîlan, bicîh bikin ku hemû avêtîyên ku ketine xwarê tên rakirin.

Li sîteyan çêtirkirina parkkirinê

Carinan dikane ji bo nişstecîhan dijwar be ku erebên xwe li sîteyan û herêmên derdorê park bikin, bi sedema hejmareke mezin a wesayîtên bê destûr.

Ji ber vê yekê, Hackney Homes bi hevkarîya Xizmetên Parkkirinê xebatê dike ku kontrola li sîteyan xurttir bike. Bi vê yekê, em ê bicîh bikin ku wesayîtên bê destûr li sîteyê nemînin û ku:

- nişstecîh û mêvanên wan bikanibin li cîhên veqetandî yên sîteyan park bikin
- wesayîtên xizmeta acil bikanibin di hemû deman de têkevin sîteyan û
- pêşkêşvanên xizmetan ku li sîteyan dixebitin bikanibin li cîhên veqetandî park bikin.

Hun ê bibînin ku Karmendên Kontrola Parkkirinê rojên heftê, şevên heftê û her weha Şemîyan li sîteyan dewrîye digerin.

Ji kerema xwe dema ku hun li sîteya xwe park dikin, bila destûra we ya sîteyê raberkirî be.

Berî kontrolê karên plankirî
Karê destpêkirina kontrola parkkirinê dê ji nuha heta Çileya Paşîn a 2009an li sîteyên jêrîn dest pê bikin:

- Jack Dunning Estate
- Avebury Court, Colville Estate
- 25-39 Shacklewell Road Estate
- Moye Close Estate
- Landfield Estate
- Mountford Estate

Di vê demê de, li sîteyan lewheyên parkkirinê dê bên sazkirin û ji bo dîyarkirina cîhan, xet ê bên xêzandin. Dibe ku ji bo pêkanîna karan, ji we bê xwestin ku hun wesayîta xwe bidin alî. Ji bo van karan, hun ê berê bên agahkirin.

Ji Sibata 2009an û pey ve, hun ê bikanibin destûra xwe ya parkkirina li sîteyê ji Ofîsa Taxê bikirin ku xwe ji bo kontrola ku di Adara 2009an de dest pê dike amade bikin.

Heke ji we re bêtir şêwirdarî pêwsît be, ji kerema xwe li gel Ofîsa Taxa xwe têkilî çêbikin.

Heywanekî we yê malê heye?

Bibîr bînin, tiştê ku hun (û heywanê we) li mala xwe û li dora wê dikin, dikane bandorê li cîranan bike. Ji kerema xwe îhtîmam bikin û bi bîr bînin:

- Divê hun bikin ku heywanên we di bin kontrolê de bin, wek nikanibin birevin an zirarê bidin milk an herêmên hevpar.
- Divê heywanên we cîranan aciz nekin an netirsînin. Pîsî kirin, dengezarî an bîhn jî di nav vê de ne.
- Divê hun nehêlin ku heywanê we li mala we yan herêmeke ku hun û cîran pev re bikar tînin, pîsîyê bike. Heke hun bihêlin ku heywanê we li herêmên gelêrî pîsîyê bikin an bê xwedî bigerin, dibe ku hun cezaya peran bixwin an doza dadgehê li we vebe.
- Nehêlin ku kûçikê we bi domdarî li hundir û dervê mala we biewte (bireye).
- Em dikanin nehêlin hun an kesekî bi we re heywanan xwedî bikin, heke hun nebin xwedîyekî bi berpirsî (mesûlîyet).

Heke pirsên we hebin an ku hun dixwazin ku tiştek bêtir bê îzehkirin, li gel Ofîsa Taxa xwe têkilî çêbikin.

Nûçeyên Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan

***Nûçeyên Xwedî-lease û Xwedî-milkan* - Hejmara Çileyê Pêşîn di demeke kin de tê weşandin …**

Xwedî-lease û xwedî-milkên li navçeyê dikanin di hejmara bê ya *Nûçeyên Xwedî-lease û Xwedî-milkan* de bêtir nûçe û agahîya bi kitkit hêvî bikin. Hun ê li ser dîsa bi kirê dayina mala xwe û xizmetên dawî yên ser înternetê ku Hackney Homes pêşkêş dike agahîyê bistînin.

Mesrefên weşandin û postekirina Beş 20b Daxuyanîyên ji bo xwedî-lease'an

Di Cotmeha 2008an de, Xizmetên Xwedî-Lease û Mafê Kirînê rastîyên 2007/08an çenekî dereng weşandin, ji ber pirsgirêkên çapkirinê. Ji ber ku rastî berî 30ê Îlonê, ku tarîxa dawî bû, nehatin weşandin, ji bo me pêwîst bû ku em daxuyanîyên Beş 20b biweşînin. Ji kerema xwe hay jê hebin ku mesrefê weşandin û postekirina daxuyanîyên Beş 20b ê li hesabê danêrên bihayê xizmetê neyê qeydkirin.

BIBÎRANÎN ji bo ewlehîya gazê…we dizanî?

- Wek xwedî-lease'ekî, hun ji servîskirina pêwengên gazê yên li milkê xwe berpirs in
- Tê temîkirin ku hun hemû pêwengên gazê yên li milkê xwe qet nebe salê carekê servîs bikin
- Heke hun milkê xwe bidin kirê, berpirsîya we ya zêde ji bo ewlehîya hemû kesên li milkê we çêdibe û ji alîyê qanûnê ve pêwîst dibe ku hun kontrolên gazê çêbikin û heke wisa nekin, dibe ku doz li dijî we vebe
- Heke hun bidin kirê, erka we ya qanûnî ye ku hun ewlehîya hemû kesên li milkê xwe bicîh bikin

- Heke li milkê we bîhna gazê were, telefon bikin bo TRANSCO li 0800 111 999. TRANSCO ji borîyên gazê berpirs e.

Wêneyekî performansê - Fokusa vê mehê: Ewlehîya sîteyê

Ewlehîya nişteçîhên me ji bo Hackney Homes girîngîya herî pêşde ye.

Heke bi şêlên antîsosyal têkildar pirsgirêkên we hebin, divê hun li gel Ofîsa Taxa xwe têkilî çêbikin. Ew ê yan bikanibin alîkarîya we bikin, yan jî dozê sewk bikin bo yek ji tîmên me yên pispor.

Ji Nîsana 2008an heta îro:

1. Me bi tevayî 12 operasyonên nêrevanîyê pêk anîne ku bi çalakîyên antîsosyal mijûl bibin
2. Me 48 çalakîyên îstasyona radyo ya qorsan û neqanûnî girtin
3. 88 operasyon/çalakîyên taybetî yên serdegirtinê li dijî pêşkêşvan û bikarhênerên narkotîkê yên Çîn A hatine pêkanîn.

Ji bo bêtir agahîya li ser raporkirina performansê, li gel Tîma Performansê têkilî çêbikin li Housing.Performance@hackneyhomes.org.uk an jî biçin www.hackneyhomes.org.uk/hh-about-us-performance

50+ şîva Roja Krîsmis

inShape, Hevparîya Jîyana Bijûn ji bo ser 50 salîyên Hackney, bi hevkarîya KKNa Fellows Court û KKNa St Marys Estate, ji bo mirovên 50+ salî ku an na wê bi tenê bin, şîveke Roja Krîsmis saz dike.

Şîv ê roja 25ê Çileyê Pêşîn bê sazkirin, xwarina malê, şahî û hevaltîya xweş ê bê pêşkêşkirin. Heke hun dixwazin tev lê bibin, ji kerema xwe telefon bikin bo 020 7923 9031 an 020 7923 8690. Cîh bi sînor in û wê bi awayê ku kî berê bê ew berê cîh distîne, bên veqetandin.